

ŞEHITÎN

Perwaneya geremolê deng ji xwe birî
Di atlasa uryan a şevê de
Destên mirovê ewil diaxfîn.

*

Di nav çengên wî de herfên hûrdek ên baranê
Qûm robarekî diguhezînin behrê.

*

Ger min ne nivîsandana, tu yê nejiyana.

*

Di malên bêkulek de
Zêmareke bûkî ya dawên wê bi xerîbiyê morkirî bûm.

*

Hey ciwaniya sermedî
Em ê rojekê bibin temenhev.

*

Ji goristanê ber bi behrê ve
Rêwîtiyeke erxewanî
Her du cîhan li hev dilefîn.

*

Çi bibe piştî perdekêşanê dibe
Kerekerî ez dertêm derve.

*

Çend roje di bîra min de deryaçeya mijangên te
Bi rêzdarî li zemanekî xeniqîn dinihêrim.

*

Mohra nava her du biriyên xwe nîşanda
“Ma ruhê mirovan dixuyê?”
Herf ji mijangên wî diweşîyan.

*

Dem emaneteke têkildarî siya parkê ye
Bi bêdengkî bi zarokan re zîl dide
Tenêtî di odeyan de hîlnayê.

*

Vebe ey deriyê xêr û bêrê vebe!
Mal, ji zûv de terkî xeberoşka xwe kiriye.

*

Zarok kevir veserî herfên jiyanê kirin

Dayik hêbêtir li dûrahiyê dinihêrin
Dayik hêbêtir spî ne.

*

Birîna mirov dema mirov sax be dicebire.*
Dema bi vê gotinê min şewq dida sibeha şevê
Sî û çar zarok kuştin.

*

Ji bîr neke, zimanê gorîçeyan tune.

*

Dema tu diaxifî
Çivîkên sor
Ji mijê dertên ber rojê.

*

Diya min dîsa bêdeng ma
Hungilîska xwe di tiliya xwe de dibir û dianî
Zemanê li dîwêr qet derbas nabe.

*

Min bawer kir, ne roj e
Çûk sibehê didin destpêkirin.

*

Zarok xemeke bimoîk
Jin diaya windayî ya xudayên nû
Zilam bênavber ji caman dikeve.

*

Li nêv bexçe kîsek xwê
Dibêje, şitlên min î frîngiya dixwun
Şeytanok bi vê xirabiyê nizanin.

*

Ger ewqasî bawer nekirina
Ne rastiya wî ne jî xeletiya wî dihate kişandin.

*

Gotina min di devê wî de ma
Tu ji kê re çî dibêjî bibêje
Wê hevoka te bi min dest pê bike.

*

Dibe bihuşt şîn be lê
çîleya mirov hîn xweşikî e.*
Ji nişka ve min ji jiyana xwe hez kir.

*

Şebşebok li bexçe taveheyvê parve dikin.

*

Bi dirêjkirina pirtûka destê xwe got,
Ev jî bîranîna tiştên ku me ne jiyane.

*

Bes hikmekî van gotinan heye:
Ez ji te hez dikim.

*

Ger kesekî/ê ku me sewal bike hebe
Bibêje stiyê min qûnika hirmiyê giyanê min sax e*

*

Zeytûn kulîlk dan
Behr mijelangî bûn
Wusa dijwar derbas bû ku ji ber xizaniya me
Giyane me pel girtin.

*

Bêdengmayîn birîne nacebirîne
Gotinên berê xwe digihînin cihên nû.

*

Saeta girtina deriyên
Şemûg, sî, mijang—
Tenêti destekî xwe bi yê din germ dike.

*

Hespên bêdeng ên cîhana extiyarok
Wê li beriyê çêranê bidomînin.*
Xwezil mirî li asîmanan bihatanan naştin.

*Bi rêzê, Metin Eloğlu, Van Gogh, Ercişli Emrah, Gérard Chaliand

Şükrü ERBAŞ
Ji Tirkî bo Kurmancî: Rêdûr DÎJLE